

## **ANALİZEKE KODİKOLOJİK LI SER LEYLA Û MECNÛNÊN SEWADÎ, BAZÎDÎ Û FUZÛLÎ DI KOLEKSİYONA A. JABA YA DESTNIVÎSÊN KURDÎ DE**

**Abdurrahman ADAK\***

### **PUXTE**

Di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de sê nusxeyên Leyla û Mecnûnê hene ku her yek ji wan ya nivîskarekî cuda ye. Di jimareya Kurd 30ê de Leyla û Mecnûna Sewadî (bi kurdî), di ya Kurd 31ê de Leyla û Mecnûna Mela Mehmûdê Bazîdî (bi kurdî) û di ya Kurd 14ê de jî Leyla û Mecnûna Fuzûlî (bi tirkî) cih digirin. Her sê nusxe jî li gor tamamî, fêmarî û dêrîniyê ve ku pîvanên kodikolojiyê ne nusxeyên binirx in. Di her sêyan de jî qeydên istinsaxê hene. Di qeyda istinsaxê ya nusxeya Fuzûlî de navê mustensix cih digire, lêbelê di her duyên dî de cih nagire. Digel vê jî doneyên di dest de nîşan didin ku nusxeya Bazîdî ji aliyê Bazîdî bi xwe ve hatiye istinsaxkirin. Salên istinsaxê yên nusxeyên Fuzûlî û Bazîdî hatine qeydkirin, lêbelê ya Sewadî nehatiye qeydkirin. Ya Fuzûlî di sala 1218 (1803/1804), ya Bazîdî jî di sala 1274 (1858-59)an de hatiye istinsaxkirin. Doneyên ber destan navbera tarîxî ya istinsaxa nusxeya Sewadî wek 1759 ve 1857 nîşan didin. Ji ber ku li ser zehriyeya nusxeya Bazîdî eslê nusxeyê wek Leyla û Mecnûna tirkî hatiye nîşandan, mijara eslê vê nusxeyê hatiye rojevê. Li gor A. Jaba eslê vê Leyla û Mecnunê, Leyla û Mecnûna tirkî ye û li gor Rudenko ya Kurdî ye. Berawirdiya ku di navbera metnan de ji aliyê me ve hatin kirin derxist meydanê ku nêrîna Rudenko dirust e.

**Bêjeyên Sereke:** Koleksiyona A. Jaba, Fuzûlî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Sewadî, Leyla ile Mecnûn, kodikolojî.

### **A. JABA KÛRTÇE YAZMA ESER KOLEKSİYONUNDAKİ SEWADÎ, BAZÎDÎ VE FUZÛLÎ'YE AİT LEYLA Û MECNÛNLARIN KODİKOLOJİK BİR ANALİZİ**

#### **ÖZ**

A. Jaba el yazma eser koleksiyonunda her biri farklı bir yazara ait olan üç tane Leyla ile Mecnun nüshası bulunmaktadır. Kürd 30 no'lu nüshada Sewadî'nin (Kürtçe), Kürd 31 no'lu nüshada Mela Mehmûdê Bazîdî'nin (Kürtçe) ve Kürd 14 no'lu nüshada ise Fuzûlî'nin (Türkçe) Leyla ile Mecnunları bulunmaktadır. Her üç nüsha da kodikolojinin tamlık, anlaşılabilirlik ve eskilik gibi kriterlerine göre

---

Makale Gönderim Tarihi: 01.06.2018, Kabul Tarihi: 31.07.2018  
Doi: 10.26791/sarkiat.443978

\* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.  
[abdurrahmanadak@gmail.com](mailto:abdurrahmanadak@gmail.com), Orcid ID: 0000-0002-9124-1605

değerli nüshalardır. Her üçünde de istinsah kayıtları mevcuttur. Fuzûlî nüshasının istinsah kaydında müstensihin adına yer verilmiş, diğer ikisinde ise buna yer verilmemiştir. Bununla birlikte eldeki veriler Bazidi nüshasının Bazîdî'nin kendisi tarafından istinsah edildiğini ortaya koymaktadır. Fuzûlî ve Bazîdî nüshalarının istihzah yılları kaydedilmiş, Sewadi nüshasınınki ise kaydedilmemiştir. Fuzûlî'ninkisi 1218 (1803/1804), Bazîdî'ninki ise 1274 (1858-59) yılında istinsah edilmiştir. Eldeki veriler Sewadi'nin Leyla û Mecnûn'unun istinsah tarihini 1759 ve 1857 aralığı olarak belirlemektedir. Bazidi nüshasının zahriyesinde bu eserin aslının Türkçe Leyla ile Mecnun olduğuna dair bir not yazıldığı için, bu nüshanın aslı konusu gündeme gelmiştir. Bu konuda görüş belirten A. Jaba'ya göre bu Leyla ile Mecnûn'un aslı, Fuzûlî'nin Türkçe Leyla ile Mecnûn'u, Rudenko'ya göre ise Sewadi'nin Kürtçe Leyla ile Mecnun'udur. Metinler arasında yaptığımız karşılaştırmalı inceleme, Rudenko'nun görüşünün yerinde olduğunu ortaya koymuştur.

**Anahtar Kelimeler:** A. Jaba koleksiyonu, Fuzûlî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Sewadî, Leyla ile Mecnûn, kodikoloji.

#### AN CODICOLOGICAL ANALYSIS OF THE SEWADÎ, BAZÎDÎ AND FUZÛLÎ'S LEYLA Û MECNÛNS IN A. JABA'S COLLECTION OF KURDISH MANUSCRIPTS

##### ABSTRACT

There are three Leyla and Mecnun copies in the collection of A. Jaba manuscripts, each belonging to a different writer. In the copy Kurd 30 there is Sewadi's Layla and Majnun (Kurdish), in Kurd 31 there is Mela Mehmud Bazîdî's (Kurdish) and in Kurd 14 there is Fuzuli's (Turkish) Layla and Majnun. All three copies are valuable copies according to criterias such as completeness, clarity and oldness of the codicology. All three have information about their recordings on them. Fuzûlî's copy has the name of the recorder on it, while the other two do not include it. However, the available data suggests that the Bazidi copy was recorded by Bazidi himself. The years of recording of the copies of Fuzûlî and Bazîdî's are written, while the date of Sewadi's is not written. Fuzûlî's copy was recorded in 1218 (1803/1804) and Bazîdî's in 1274 (1858-59). The present data sets the date of the recording of Sewadi's Layla and Majnun as between 1759 and 1857. There is a note in the Bazidi copy that the original of this work is Turkish Layla and Majnun, so the origin of this copy is contradictive. According to A. Jaba, the original of Layla and Majnun is Fuzuli's Turkish Layla and Majnun, and according to Rudenko the original is Sewadi's Kurdish Layla and Majnun. The comparative analysis we have made among the texts reveals that Rudenko's view is proper.

**Keywords:** A. Jaba's collection, Fuzuli, Mela Mehmûdê Bazîdî, Sewadî, Layla and Majnun, codicology.

## **DESTPÊK**

Yek ji dastanên evîndariyê yê edebiyata klasîk a Rojhilata Îslamî ku hin destnivîsên wê di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de (Ji bo Jaba û arşîva wî bnr. Pîrbal, 2000, r. 3-8) li Rûsyayê li Pirtûkxaneyê Gîştî ya Lenîngradê tîn parastin dastana Leyla û Mecnûnê ye. Di vê koleksiyonê de sê destnivîsên dastana Leyla û Mecnûnê hene ku di bin jimareyên Kurd 14, Kurd 30 û Kurd 31ê de tîn parastin. Di jimareya Kurd 30ê de Leyla û Mecnûna Sewadî (sedsal: XVIII), di ya Kurd 31ê de Leyla û Mecnûna Mela Mehmûdê Bazîdî (sedsal: XIX) û di ya Kurd 14ê de jî Leyla û Mecnûna Fuzûlî (sedsal: XVI) cih digirin. Ji van nivîskaran Sewadî û Bazîdî nûnerên edebiyata kurdî, Fuzûlî jî nûnerekî edebiyata tirkî ye û hevterîbê vê yekê jî Leyla û Mecnûnên Sewadî û Bazîdî bi kurdî û ya Fuzûlî jî bi tirkî ye.

Di vê gotarê de armanca me ew e ku em di çarçoveya kodîkolojîyê ku tê wateya zanista destnivîsariyê (Ji bo kodîkolojîyê bnr. Binbîn&Şewqî, 2005) de li ser van her sê nusxeyên Leyla û Mecnûnê analîzekê bikin. Em dê ji aliyê form û şewazên edebî, tema û cureyên edebî ve serederiyê bi van her sê berheman re nekin, em dê tenê ji aliyê mijarên kodîkolojîyê yê wek danasîna nusxeyên destnivîs, nîrxê nusxeyan û pêwendîya di navbera nusxeyan de li ser wan rawestînin, ji van aliyan ve wan berawird bikin û derheqê van mijaran de bigihîjin encamekê.

Lêbelê em dixwazin bînin ziman ku di vê gotarê de perspektîfa me kurdolojî ye û ji ber vê jî em dê di gotarê de giraniyê bidin ser her du Leyla û Mecnûnên kurdî. Loma jî di gotarê de her du Leyla û Mecnûnên kurdî dê ji ya tirkî zêdetir cih bigirin. Bêguman ji bo ku em bikarin li ser bi axîfîn, zanyariyên pêwîst di biwara kodîkolojîyê (zanista destnivîsariyê) de derheqê Leyla û Mecnûna Fuzûlî de dîsa dê bînin pêşkêşîkirin. Leyla û Mecnûna Fuzûlî, dê bi qasî pêwendîya xwe ya bi her du Leyla û Mecnûnên kurdî re bibe mijara gotarê. Pêwendîya Leyla û Mecnûna Fuzûlî bi kurdolojîyê re ew e ku di nav koleksiyoneke destnivîsên kurdî de cih girtiye û li gor nêrînekê Leyla û Mecnûna Fuzûlî wek jêdera Leyla û Mecnûna Bazîdî hatiye qebûlîkirin. Ji aliyekî dî ve divê bê gotin piştî nêrîneke dijberî vê jî derketîye holê û Leyla û Mecnûna Sewadî ji bo Leyla û Mecnûna Bazîdî wek jêder hatiye qebûlîkirin. Ev jî nîşan didin ku li cihê ku behsa Leyla û Mecnûnên kurdî yê koleksiyona A. Jaba bê kirin, eger behsa ya Fuzûlî neyê kirin mijarê dê kêmbimîne. Loma divê bê gotin ku armanceke sereke ya vê gotarê jî ew e ku di çarçoveya van her du nêrînan dijber de pêwendiyên van her sê Leyla û Mecnûnan ku di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de cih digirin zelal bike.

Ji bilî beşên destpêk û encamê gotar li ser sê beşan dê bê dabêşîkirin. Di beşa yekem de danasîna her sê nusxeyan (tewsiîfa nusxeyê) di çarçoveya lîsteya standard a danasîna destnivîsan de dê bê kirin. Di beşa duyem de nîrxê nusxeyan di çarçoveya zanista destnivîsariyê de dê bê tesbîtkirin. Di vê beşê de em dê li ser esasên zanyariyên ku di beşa danasîna nusxeyan de hatine dayîn, her sê nusxeyên destnivîsên *Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û Fuzûlî* ku di arşîva Jaba de cih digirin li gor krîterên destnivîsariyê analîzê bikin. Di vê analîzê de em dê pêşî nîrxê

her du nusxeyan tesbît bikin pêwendiyên wan derxin meydanê û bi taybetî jî girîngiya Kurd 31ê di çarçoveya pexşana kurdî de derxin meydanê. Di beşa sêyem de jî pêwendiya her sê nusxeyan dê bê aşkerakirin.

## I. DANASÎNA NUSXEYAN

Di vê beşê de em dê li ser nasandina nusxeyên destnivîs ên mesnewiya Leyla û Mecnûn ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin rawestin. Çawa tê zanîn di tewsîfa nusxeyê de şabloneke tradîsyonel heye ku pêwîst e nusxeya destxet, li gor wê şablonê bê nasandin. Xalên ku di vê şablonê de cih digirin, ji aliyê derekî yê nusxeyê ber bi aliyê navekî ve tîrên rîzkirin (Ji bo agahiyên berfireh derheqê tewsîfa nusxeyan de bnr. el-Munecid, 1976; Kavakçı, 1991, r. 23-25; Bilgin, 2013, r. 369-373). em dê jî ji bo nasandina her sê nusxeyan pêşî serî li vê rêbazê bidin û şablona klasîk a tewsîfa nusxeyê amade bikin. Li vir divê bê gotin ku kurdologa rûs Margarîta B. Rudenkoyê hemû destnivîsên ku di arşîva Jaba de cih digirin tewsîf kirine û ew bi şeweya katalogekê çap jî kirine (Rudenko, 1961). Lêbelê hem di kataloga Rudenkoyê de xalên ku di şablona tewsîfa nusxeyê de cih digirin hindik in hem jî zimanê katalogê rûsî ye. Loma em dê li vir ji nû ve tewsîfa her sê nusxeyên Leyla û Mecnûnê bi awayekî berfirehtir û bi Kurmancî amade bikin. Lêbelê ji ber ku nusxeyên orjînal li Rûsyayê di Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê de ne û di destê me de tenê nusxeyên wan ên dijîtal hene, em dê zanyariyên hin xalan di çarçoveya nusxeyên dijîtal de pêşkêş bikin ku di serê van xalan de taybetiyên bergê, filîgrana kaxezê û ebadên kaxezê tîrên. Aşkera ye ku ji bo bidestxistina encameke tam, pêdivî bi dîtina nusxeyên orjînal heye. Ji ber ku di kataloga Rudenkoyê de ebadên kaxezê hene, me di vê xalê de xwe spart zanyariyên Rudenkoyê. Ji ber ku dijîtalên wan rengîn in, dikare bê gotin ku heta astekê di rengê kaxezan de jî îsabet hatiye bidestxistin. Lêbelê heta orjînalên nusxeyan neyên dîtîn, îsabetkirina di zanyariyên berg û filîgranê de pir zehmet e. Loma di tewsîfê de em dê cih nedin van her du xalan. Ji bilî van awarteyan di tevahiya xalên din ên tewsîfê de zanyariyên rast û durist hatine bidestxistin.

### 1. 1. Danasîna Nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî)

1. Navê berhemê : *Leyla û Mecnûn*
2. Te'lîf, tercume, şerh : Te'lîf
3. Navê nivîskar : Sewadî
4. Cih (bajar û dewlet) : Lenîngrad, Rûsya
5. Navê Pirtûkxaneyê : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. Koleksiyon : Koleksiyona A. Jaba
7. Pirtûkxane no : Kurd 30
8. Zimanê destxetê : Kurdî (Kurmancî)
9. Taybetiyên bergê : Berga wê karton e û rengê wê şîn e.
10. Serbixwe-mecmû'e : Serbixwe
11. Tarîxa telîfê : 1172 (1759)
12. Menzûm-mensûr : Menzûm

- 13. Rengê kaxezê** : Zer
- 14. Rewşa kaxezê** : Kaxez ne rizî ye, lêbelê li du sê ciha tayê ku kaxezan bi bergê ve girê dide sist bûye û wereqên 31b-32a'yê bi tamamî hev berdane. Dema berhem vedibe, di navbera her du wereqan de berga piştê berhemê xuya dike.
- 15. Jimara wereqan** : Ji aliyê pisporan ve piştê bi qelemzîreçê li jêra rûyê a'yê bi jimarên latînî bişêweya 1, 2, 3.. jimar hatine dayîn. Bi giştî berhem ji 39 wereqan pêk tê (78 rûpel).
- 16. Ebadên kaxezê** : 20x14 (17x12), (Rudenko, 1961, r. 61).
- 17. Cureya xetê** : Nesx
- 18. Îmla** : Xweş e û bi hereke ye. Di dawiya hemû misrayan de û li cihên vala bi murekkeba sor sê xal hatine danîn.
- 19. Murekkeb** : Berhem bi murekkeba reş, sernav bi murekkeba sor hatine nivîsîn. Murekkeb li hin cihan tûşî oksîtê hatiye û derbasî rûyê paş bûye. Murekkeb di hin rûpelan de jî belav bûye. Di wereq 31b de bi qasî serî tiliyê (daîreyeke biçûk) murekkeb rijiyaye û ev murekkeb derbasî 31a 32 a 32b û 33a bûye.
- 20. Jimara beşan** : 24
- 21. Sernav** : 23 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
- 22. Jimara beytan** : 339
- 23. Jimara rêzan** : 10
- 24. Peyva te'qîbê** : Heye.
- 25. Qeyda istinsaxê** : “*Temmet kitabû Leylî Mecnûn li ecl el-Hacî Fîrûz Efendî xefere'llahu lehu ve lena, amîn ya mu'în*” (Kitêba Leyla û Mecnûnê tamam bû. Ji bo Hacî Fîrûz Efendî hat istinsaxkirin. Xudê rehma xwe li wî û me bike, amîn ya mu'în.) (wr. 39b).
- 26. Qeyda temellukê** : Sahibuhu el-Hacî Fîrûz ibn el-Hacî Mustefa (wr. 39b).
- 27. Destpêka destxetê** : “*Fehristê kitabê navê me'bûd / Qeyyûm û qedîm û heyy û mewcûd*”(wr. 1b).
- 28. Dawiya destxetê** : “*Mecnûn û cenazê nîgarê / Danîne mehafeya mezarê*”(wr. 39b).

## 1. 2. Danasîna Nusxeya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî)

- 1 Navê berhemê** : *Kitabu Tercemeê Leyla Mecnûna Tirkî bi Zimanê Ekrad û Kurmancî*
- 2 Te'lif, tercume, şerh** : Tercume
- 3 Navê mutercim** : Mela Mehmûdê Bazîdî
- 4 Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
- 5 Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
- 6 Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba
- 7 Pirtûkxane no** : Kurd 31
- 8 Navê xwedî** : A. Jaba

- 9 **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
- 10 **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
- 11 **Cihê tercumeyê** : Erzirûm
- 12 **Tarîxa tercumeyê** : 1274 (1858-59)
- 13 **Menzûm-mensûr** : Mensûr
- 14 **Zehriye** : Zehriye heye. Di zehriyeyê de navê berhemê, dîroka nivîsîna berhemê û derheqê navê berhemê û navê nivîskar de hin têbîniyên bi zimanê Frensî ku piştê bi qelemê cuda hatine nivîsîn hene.
- 15 **Rengê kaxezê** : Zer
- 16 **Jimara wereqan** : Wereqên rûyê b'yê vala ne. Berhem ji wereq 1a dest pê dike û bi wereq 86b diqedê. (wr. 1a-86b). Lêbelê berhem li gor rêzbendîya pirtûkên çapkirî û bi jimarên erebî hatiye jimarekirin. Li gor vê berhem ji 172 rûpelan pêk tê. Di vê rêzbendiyê de zehriye nehatiye jimarekirin.
- 17 **Ebadên kaxezê** : 21x18 (16,5x13), (Rudenko, 1961, r. 63).
- 18 **Cureya xetê** : Riq'e
- 19 **Îmla** : Nivîseke zelal e û bê hereke ye. Di valahiyên navbera peyvan û di dawîya rêzan de bi murekkeba sor xalên girover hatine danîn. Di hemû rêzan de li ser du, yan sê peyvan xêzên biçûk û sor hatine kişandin.
- 20 **Murekkeb** : Reş
- 21 **Jimara beşan** : 23
- 22 **Sernav** : 22 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
- 23 **Jimara rêzan** : 7
- 24 **Peyva te'qîbê** : Heye.
- 25 **Qeyda istinsaxê** : “*Temmet tercemeê Leyla Mecnûn bi Kurdî 1274*” (Tercumeya Leyla û Mecnûnê bi Kurdî temam bû.” (wr. 86b). Li bin vê qeydê tercumeya wê ya bi Frensî jî hatiye nivîsîn.
- 26 **Qeyda temellukê** : “*Kutibet li eclî Mîr Jaba Beg*” (Ev berhem ji bo Mosyo Jaba Beg hatiye nivîsîn.) (wr. 86b). Li bin vê qeydê tercumeya wê ya bi Frensî jî hatiye nivîsîn.
- 27 **Destpêka destxetê** : “*Bismillahi'r-Rehmani'r-Rehîm. Paş hemd û senayê Cenabê Hezret*” (wr. 1b).
- 28 **Dawîya destxetê** : “*Qenc cenabê Xwedê Te'ala bi heqîqetê halê dizanîtin. Wellahu e'lemu bi's-sewab.*” (wr. 86b)

### 1. 3. Danasîna Nusxeya Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî)

1. **Navê berhemê** : *Leyla û Mecnûn*
2. **Te'lif, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Fuzûlî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba

7. **Pirtûkxane no** : Kurd 14
8. **Zimanê destxetê** : Tirkî
9. **Taybetiyên bergê** : Wêneyên rûyên derve yên bergê nehatine kişandin, lêbelê yên rûyên hundir hatine kişandin. Li gor vê di rûyê hundir ê bergê de kaxezeke sipî cih digire. Li hin cihan kenarên van kaxezan jê çûne. Li van cihên jêçûyî çermekî sor dixuye. Ji vê jî tê fêmkirin ku derveyê bergan bi çermekî sor hatine rûkirin.
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Di nav mecmû'eyeke du berhemî de berhema yekem e.
11. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
12. **Rengê kaxezê** : Zera tarî
13. **Rewşa kaxezê** : Wereq 105a-111a tûşî avê hatine, lêbelê ji xwendinê re nebûye asteng.
14. **Jimara wereqan** : Di nav wereqên 1b-83b de cih digire.
15. **Ebadên kaxezê** : 22x15 (20x12), (Rudenko, 1961, r. 38).
16. **Cureya xetê** : Nesx-riq'e
17. **Îmla** : Îmla xweş e û bê hereke ye.
18. **Murekkeb** : Di nivîsê de murekkeba reş hatiye bikaranîn. Lêbelê sernavên beşan bi murekkeba sor hatine nivîsîn.
19. **Jimara beşan** : 58 beş (Di nav beşan de 22 xezel û murebbeek jî cih digirin.)
20. **Sernav** : 23 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
21. **Jimara rêzan** : Bi giştî 19 rêz in.
22. **Qeyda istinsaxê** : “*Temmeti'l-kitab bi 'ewni'l-lah meliki'l-wehhab 'ela yed ed'efi'l'ibad Tahir ibn Ebbas Efendî sene 1218 fi şehri Rebî'i'l-Axir. Ah mine'l-mewt we halatihî*” (Ev kitêb bi arîkariya Xudayê melik û wehhab bi destê Tahirê kurê Ebbas ku kêmîrînê îbadan e di sala 1218an de di meha Rebî'ulaxirê de xilas bû. Ax ji mirinê û rewşên wê) (wr. 83b). Heman kesî di meha çarem a sala 1218an de Leyla û Mecnûn xilas kiriye û di meha nehem (Remezane) a heman salê de jî Mem û Zîn xilas kiriye.
23. **Navê mustensix** : Tahir ibn Ebbas Efendî
24. **Temelluk** : “*Sahib ve maliki 'Ebdurrehman Efendî bin Mehmûd Efendî bin Ebdurrehman-ı Rûmî rehmeten wasi'eten*” (Xwedî û malikê wê 'Ebdurrehman Efendî kurê Mehmûd Efendî kurê Ebdurrehmanê Rûmî ye.) (wr. 83b).
25. **Destpêka destxetê** : “*We bihî neste'in Bismillahi'r-Rehmani'r-Rehîm. El-Hemdu li wahibi'l-mekarim / We's-Şukru li sahibi'l-merahim*”(wr. 1b).
26. **Dawiya destxetê** : “*Hem maslahat ol ki urmayam dem / Xetm eyleyelüm ki xayr-ı bi't-temm*”(wr. 83b).

## II. NIRXÊ NUSXEYAN

Ji ber ku di zanista destnivîsariyê de nirxê nusxeyên destnivîs, bi xalên wek fêambarî, temamî û dêrîniya nusxeyê, herweha bi hebûna teshîh û sererastkirinên li ser nusxeyê tê pîvan (Bergsträsser, 2011, r. 1; Esîlan, 1994, r. 131-134) em dê jî di

çarçoveya van xalan de û bi rêbazê berawirdî li ser her sê nusxeyên Leyla û Mecnûnê yên arşîva A. Jaba analîzekê bikin û nîrxê wan destnîşan bikin. Ji ber ku em di çarçoveya kurdolojiyê de li mijarê dinêrin, em dê pêşî li ser her du nusxeyên kurdî rawestin.

Eger em ji aliyê fêmbariyê ve li her du nusxeyên kurdî binêrin, em dê bibînin ku di vê biwarê de rewşa wan gelekî baş e. Ji ber ku di her du nusxeyan de îmlayeke rast û durist hatiye bikaranîn û her du jî bi nivîseke xweş hatine nivîsîn xwendina wan gelekî hêsan e. Bi vê xalê ve girêdayî em dibînin ku di van nusxeyan de serî li teshîhan nehatiye dayîn, yanî cihên ku hatine sererastkirin tunene. Bêguman nebûna teshîhan encama fêmbariya nusxeyan e. Loma ev yek ne wek xaleke nerênî, wek xaleke erênî divê bê dîtin. Di encamê de em dikarin bibêjin her du nusxe jî ji aliyê fêmbarî û teshîhan ve nusxeyên binîrx in.

Ji aliyê temamiyê ve, her du nusxe ji destpêkê heta dawiyê bi awayekî yekpare û bê kêmasî gihîştine roja me ku ev yek nîrxê wan gelekî bilind dike. Hevterîbê temamiyê di her duyan de qeydên istinsaxê jî cih digirin. Lêbelê ji vî aliyê ve rewş hinekî aloz e. Lewra ji aliyekî ve di hemanên qeydên istinsaxê yên bingehîn de hin kêmasî hene, ji aliyekî ve hin zanyariyên ne pêdivî di wan de hene, ji aliyekî ve jî bi hin nîşaneyan hin zanyariyên dî tîn bidestxistin. Berî her tiştî mustensixan di qeydên istinsaxê de navên xwe nenivîsîne ku ev di çarçoveya tradîsyona qeydên istinsaxê de kêmasiyeke girîng e. Lêbelê divê bê gotin ku şûna vê navên kesên ku nusxe ji bo wan istinsax kirine, yanî navên xwediyên nusxeyan nivîsîne. Li gor vê Kurd 30 jî bo kesekî bi navê Hacî Fîrûz Efendî, Kurd 31 jî ji bo A. Jaba hatine istinsaxkirin. Xwediyê nusxeya Kurd 30ê, li kêleka qeyda istinsaxê di qeydeke cuda de dîsa hatiye aşkerakirin. Di vê qeydê de bi zimanê erebî hatiye gotin ku xwediyê nusxeyê Hacî Fîrûz Efendiyê kurê Hacî Mustefa ye. Çawa tê zanîn qeydên bi vî rengî ku xwediyê berhemê nîşan didin di lîteratura destnivîsariyê de wek “qeyda temellukê” tîn binavkirin û tiştekî asayî ye ku malikê/xwediyê nusxeyê bi qelesa xwe binivîse. Li vê derê jî ji ber ku qeyd bi qelem û nivîseke cuda ye û tê de navê bavê mustensix jî cih digire, bi ihtîmaleke mezin nivîserê vê qeydê xwediyê nusxeyê Hacî Fîrûz Efendî bixwe ye. Yanî xwediyê nusxeyê mulkiyeta xwe bi destê xwe nivîsiye û cih daye navê bavê xwe jî. Wek encam, di her du nusxeyan de nebûna navên mustensixan wek kêmasî, lêbelê dîsa di her duyan de hebûna zanyariyên derheqê xwediyên nusxeyan de û bi taybetî di nusxeya Kurd 30ê de hebûna “qeyda temellukê” divê wek taybetiyeke erênî û ciyaker a vê nusxeyê bê qebûlîkirin.

Herçiqas di qeydên istinsaxê yên her du nusxeyan de navê mustensix nehatiye nivîsîn ji, di vê xalê de cudahiyeke Kurd 31ê ji Kurd 30ê heye. Lewra ji hin nîşaneyan mustensixê vê nusxeyê aşkera dibe ku ew jî Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Ji van nîşaneyan a herî girîng têbîniyeke frensî ye ku ji aliyê A. Jaba ve li ser zehriyeya vê nusxeyê hatiye nivîsîn. Li gor vê têbîniyê Mela Mehmûdê Bazîdî ev Leyla û Mecnûn ji zimanê tirkî tercumeyî Kurmancî kiriye. Ji ber ku Jaba hevkarê Bazîdî ye, ev têbîniya wî ya derheqê Bazîdî de têbîniyeke meqbûl e. Nîşaneyên duyem jî şêwazeke xebatê ya Mela Mehmûdê Bazîdî ye ku ew jî pexşanîkirina



mesnewiyên evînî yên kurdî ye. Aşkera ye ku Bazîdî pexşanîkirina hemû mesnewiyên evînî ku ku di koleksiyona Jaba de cih digirin, ji xwe re kiriye amanc. Yanî wî ne tenê Leyla û Mecnûn, mesnewiyên wek Mem û Zînê jî adapteyî pexşanê kirine. Ji vê jî em têdigihin ku kesê Leyla û Mecnûn bi heman şêweyê adapteyî pexşanê kiriye dîsa ew e. Dema em teşeya nivîsê, bi nusxeyên dî ku ji aliyê Bazîdî ve hatine nivîsîn berawird dikin, em dibînin ku teşeyên wan jî yek in. Di encama van xalan de aşkera dibe ku mustensixê nusxeya Kurd 31ê Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Heçî Kurd 30 e, ji bo wê tu nîşane tunene ku mustensixê wê ji me re aşkera bikin. Herçiqas di navbera her du nusxeyan de ferqeke weha hebe jî, di encamê de di qeydên istinsaxê yên her du nusxeyan de navê mustensix nehatiye nivîsîn ku ev yek derî standarda kevneşopîya destnivîsariyê ye.

Di qeyda istinsaxê ya Kurd 30ê de dîroka istinsaxê jî nehatiye nivîsîn ku ev wek kêmasiyeke mezin a qeyda istinsaxê derdikeve pêş. Lêbelê çawa ku li jêrê di encama berawirdkirina her du nusxeyan de dê bê dîtin, ji ber ku Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1857-58'ê de Kurd 31 li ber Kurd 30ê adapteyî pexşanê kiriye, divê Kurd 30 berî 1857-58'ê hatibe istinsaxkirin. Li aliyê dî ji ber ku em dizanin Leyla û Mecnûna Sewadî ku Kurd 30 yek ji nusxeyên wê ye, di sala 1759 û 1769an de hatiye te'lîfkirin, bi awayekî mentiqî navbera dîrokî ya istinsaxa vê nusxeyê dibe salên 1759 û 1857an ku dike 98 sal. Yanî em bi awayekî zelal sala istinsaxê nizanibin jî, em dizanin ku istinsaxa nusxeya Kurd 30ê ne berî 1759 û ne piştî 1857an e.

Bêguman nusxeyeke ku di vê navbera dîrokî de hatibe nivîsîn, ji aliyê dêrîniyê ve dikeve kategoriya destnivîsên kevin ên edebiyata kurdî. Ji vî aliyê ve Kurd 30 wek nusxeyeke girîng derdikeve pêş. Lêbelê em dizanin ku Leyla û Mecnûna Sewadî ne ji vê nusxeyê tenê pêk tê. Ji bo ku em cihê vê nusxeyê di nav hemû nusxeyên destnivîsên Leyla û Mecnûnê de diyar bikin, divê em destnivîsên dî yên Leyla û Mecnûnê tesbît bikin û nusxeya Kurd 30ê ji aliyê dêrîniyê ve bi wan re berawird bikin. Bêguman tesbîtîkirina hemû destnivîsên Leyla û Mecnûna Sewadî nikare bibe mijara vê gotarê. Loma em dê lêkolîna xwe bi destnivîsên ku di çapên Leyla û Mecnûnê de ji wan sîd hatiye wergirtin bi sînor bikin. Ji bo vê jî divê em pêşî li metnên Leyla û Mecnûnê yên ku heta niha ji bo weşanê hatine amadekirin temaşe bikin. Bi qasî ku tê dîtin heta niha Leyla û Mecnûn ji aliyê M. B. Rudenko (Kurdo, b.n., r. 18), Reşîd Irgat & Selman Dilovan (Siwadî, 1999), Tehsîn Î. Doskî (Doskî, 2004) û Perwîz Cîhanî (Jahany, 2016) ve hatine amadekirin û çapkirin. Lêbelê divê bê zanîn ku di van çapan de ne tenê nusxeyên destnivîs, nusxeyên çapkirî jî li ber çavan hatine girtin. Di tabloya jêrîn de digel sal û cihan ev çapên Leyla û Mecnûnê û jêderên wan ên destnivîs û çapkirî bi hev re dikarin bîn şopandin:

<b>Jimar</b>	<b>Çap</b>	<b>Sal û Cihê Çapê</b>	<b>Jêderên Wan</b>
--------------	------------	------------------------	--------------------

1.	M. B. Rudenko	Moskow 1963	<b>Destnivîsa arşîva Jaba (Kurd 30)</b>
2.	Nûbihar	Îstanbul 1999	<b>Destnivîsa Nûbiharê (1286/1870)</b>
3.	Tehsîn Î. Doskî	Hewlêr 2004	-Çapa Rudenko -Çapa Nûbiharê (Reşîd Irgat & Selman Dilovan) <b>-Destnivîsa Remezanê Kurê Seyîd Silêman</b>
4.	Perwîz Cîhanî	Mêrdîn 2016	<b>-Destnivîsa arşîva Jaba (Kurd 30)</b> -Çapa Nûbiharê (Reşîd Irgat & Selman Dilovan) -Çapa Tehsîn Î. Doskî <b>-Destnivîsa Mela Nûrullahê Godîşkî</b> <b>-Destnivîsa Mela Zeynelabidîn Amidî</b>

**Tablo 1:** *Çapên Leyla û Mecnûnê digel jêderên wan.*

Çawa ku tê dîtin di çapên Leyla û Mecnûnê de nusxeyên destnivîs ên ku sûd ji wan hatiye wergirtin pênc in: Destnivîsa arşîva Jaba (Kurd 30), Destnivîsa Nûbiharê, destnivîsa Mela Nûrullahê Godîşkî, destnivîsa Remezanê kurê Seyîd Silêman, destnivîsa Mela Zeynelabidîn Amidî. Eger em binemaya nusxeya Amidî ku nusxeya Mela Ehmed Yalar e li ber çavan bigirin, jimara nusxeyên destnivîs dê bibe şeş. Niha jî ji bo ku em bigihîjin encamekê, em dê di tabloya jêrîn de li dîroka istinsaxê ya van destnivîsan binêrin:

Jimar	Destnivîs	Dîroka İstinsaxê	Cihê İstinsaxê
1.	Kurd 30	Navbera 1759-1857an	?
2.	Destnivîsa Nûbiharê	1286/1870	?
3.	Remezanê Kurê Seyîd Silêman	1980	Rojava
4.	Mela Nûrullahê Godîşkî	1981	Tetwan
5.	Mela Ehmed Yalar	Navbera 1970-1990î	Diyarbakir
6.	Mela Zeynelabidîn Amidî	1992	Diyarbakir

**Tablo 2:** *Destnivîsên Leyla û Mecnûna Sewadî: tarîx û cihên istinsaxê.*

Daneyên tabloyê nîşan didin ku nusxeya Kurd 30ê ya koleksiyona A. Jaba ku mijara gotara me ye, ji aliyê dêrîniyê ve ji her pênc nusxeyên dî yê destnivîs kevintir e. Heta nusxeyeke kevintir dernekeve holê, nusxeya Kurd 30ê dê wek nusxeya herî kevin a Leyla û Mecnûna Sewadî bimîne. Bi vî awayî nusxeya Kurd 30ê ji aliyê dêrîniyê ve nîrxekî gelekî bilind bi dest dixê. Ji aliyekî dî ve nusxeyên bi vî rengî bi şertê ku ji aliyê fêmarî û temamiyê ve jî bikêrhatî bin, di weşanên zanistî û rexneyî de wek nusxeya bingehîn a metnê rexneyî tîk bikaranîn û wek nusxeyên mu' teber tîk qebûlkirin. Bi rastî jî dema em li weşanên heyî yê Leyla û Mecnûnê dinêrin (bnr. tablo 1), em dibînin ku ev nusxe di sê çapên Leyla û Mecnûnê de bi vî mebestê hatiye bikaranîn. Di weşana yekem a Leyla û Mecnûnê de Rudenko tenê ev nusxe esas girtiye. Tehsîn Î. Doskî û Perwîz Cîhanî jî digel

hin nusxeyên dî ev nusxe jî bi kar anîne. Ev jî nîşan didin ku nusxeya Kurd 30ê wek nusxeya her kevin di weşanên Leyla û Mecnûnê de erk û rola xwe lîstîye.

Nusxeya Kurd 31ê, ji bilî xalên standart ku me behsa wan kir, ji hin aliyên dî ve jî balê dikişîne ser xwe ku di serî de cureya wê ya edebî tê. Lewra ev Leyla û Mecnûn, ne menzûm e, pexşan e<sup>1</sup>. Çawa tê zanîn di tarîxa edebiyata kurdî de metnên edebî bi piranî bi şêweya nezmê hatine nivîsîn û pexşana kurdî zêde pêş neketiye. Bi taybetî di edebiyata klasîk a Rojhilata Îslamî de standarda çîrokên evîndariyê yên wek Leyla û Mecnûnê ew e ku bi şêweyê nezmê bîn nivîsîn. Lêbelê ev nusxeya Leyla û Mecnûnê ya ku ji aliyê Bazîdî ve hatiye nivîsîn, di vê mijarê de wek awarteyekê derdikeve pêş. Bi qasî ku me tesbît kiriye heta niha di edebiyata kurdî ya klasîk de 13 heb Leyla û Mecnûn hatine nivîsîn û di nav van de tenê ev Leyla û Mecnûn bi şêweya pexşanê ye (Adak, 2014, r. 114-115). Loma nusxeya Kurd 31ê ji aliyê cureya xwe ya edebî ve nusxeyeke cuda, girîng û binirx e.

Divê bê gotin ku di nivîsîna vê Leyla û Mecnûna pexşan de Bazîdî ne ku li pey kevneşopiyekê çûye, wî rewşeke awarte derxistiye meydanê. Bazîdî wekî pexşannûsê herî girîng ê tarîxa edebiyata kurdî, gelek berhemên pexşan nivîsandine. Di vê navberê de mesnewiyên evîndariyê yên ku ji aliyê muellifên berî wî ve bi awayê nezmê hatine nivîsandin jî derbasî pexşanê kirine û di vê çarçoveyê de Leyla û Mecnûna pexşan jî derketiye meydanê. Loma jî ne berî Bazîdî, ne jî piştî wî Leyla û Mecnûneke pexşan nehatiye nivîsîn. (Adak, 2014, r. 114-115). Loma ji vî aliyê ve ev nusxeya Leyla û Mecnûnê girîngiyeke taybet bi dest dixe.

Ev nusxe ji aliyê navê xwe ve jî ji Kurd 30ê û ji tradîsyona navên ku ji bo berhemên edebiyata klasîk hatine bikaranîn vediqete. Lewra di vê tradîsyonê de berhemên ku mijara wan çîrokên evînî ne, tenê bi navên qehremanên xwe hatine binavkirin. Wek Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn û Yûsif Zuleyxayê. Lêbelê navê vê nusxeya Leyla û Mecnûnê derî vê tradîsyonê, bi şêweyê vekirî û pexşan hatiye danîn (*Kitabu Tercemê Leyla Mecnûna Tirkî bi Zimanê Ekrad û Kurmancî*). Bêguman ev cudahî tiştêkî şeklî ye. Lê bi baweriya me li vir tiştêkî hê girîngtir heye ku ew ne şeklî ye û bi tarîxa edebiyata kurdî ve girêdayî ye. Lewra ev sernav karê ku hatiye kirin îfade dike. Ji vî aliyê ve dirûvê navên ku di lêkolînên zanistî de tên bikaranîn pê dikeve. Lewra Bazîdî karekî edebî kiriye ku ew jî tercume ye û sernavê berhemê jî di wê çarçoveyê de daniye. Ji ber ku xebatên dî yên Bazîdî jî bi vî rengî ne, ev yek bi hêsanî ji bo vê berhema wî jî dikare bê gotin. Wek encam ev berhem hem ji aliyê karê ku hatiye kirin ve ku ew jî werger e, hem jî ji aliyê navê xwe ve di nav xebatên akademîk ên tarîxa edebiyata kurdî de wek nimûneyeke pêşwext dikare bê qebûlkirin. Bêguman ev taybetî jî nixê vê nusxeyê bilind dikan.

---

<sup>1</sup> Pîrbal, Ferhad, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, weş. Aras, Hewlêr, 2000, r. 169; Cevdet Huşyar, “Zexairu’t-Turasi’l-Kurdî fî Xezaini Petersburg”, <http://www.fnrtop.com/vb/showthread.php?t=712891> (15.08.2014)

Eger em bi awayekî giştî li nusxeya Kurd 14ê binêrin, em dikarin bibêjin ku ev nusxe ji aliyê xalên wek fêmarî û temamiyê ve nusxeyeke bê kêmasî ye û binirx e. Lêbelê ev nusxe ji aliyê dêrîniyê ve ne wisa ye. Lewra dema em serdema nivîskarê wê Fuzûlî li ber çavan digirin ku ew jî sedsala XVIem e, tarîxa istinsaxa vê nusxeyê ku 1218/1804 e wek tarîxeke dereng derdikeve holê. Loma em vê nusxeyê ji aliyê dêrîniyê ve wek nusxeyeke asayî dihesibînin. Herçiqas ev nusxe bi teqezî berî nusxeya Bazîdî (Kurd 31) û di çarçoveya ihtîmalê de berî nusxeya Sewadî (Kurd 30) ye jî, em vê yekê li ber çavan nagirin. Lewra ev nusxe bi tirkî ye û bi awayekî siruştî kategoriya wê cuda ye. Pêwendiya wê bi kurdî re tenê ew e ku di nav koleksiyoneke kurdî de cih digire û ji aliyê hin lêkolîneran ve wek nusxeya jêder a Leyla û Mecnûna pexşan a Bazîdî hatiye qebûlkin.

### III. PÊWENDIYA NUSXEYAN

Eger em bîr ser pêwendiya her sê nusxeyên Leyla û Mecnûnê yê arşîva Jaba, divê pêşî em vê tesbîtê bikin ku herçiqas mijara wan yek be jî, ev ne sê nusxeyên cuda yê berhemekê ne, berevajiyê wê sê berhemên cuda ne ku ji aliyê sê nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn. Di destnivîsên edebiyata klasîk de ne tenê di nav nusxeyên cuda yê berhemekê de, di nav berhemên cuda yê ku di yek mijarê de hatine nivîsîn de jî pêwendî tê dîtin. Lêbelê ev pêwendî ne bi şeweya istinsaxê ye, bi şeweya danûstandinê ye. Ferqa van her du şeweyan ew e ku di ya yekem de pirsra “kîjan nusxe ji kîjanê hatiye istinsaxkirin” û di ya duyem de pirsra “kîjan nivîskarî ji kîjanî çî stendiye” tê pîrskirin ku pêwendiya van her sê nusxeyan bi şeweya duyem e. Di vê şeweyê de di navbera nivîskarê nû û nivîskarê berê de, bi rêya şopandin, teqlîd, wergera metnê kevin hwd. pêwendiyek çê dibe. Ji ber ku ev pêwendî herî baş li ser destnivîsan dikare bê tesbîtkin, xebatên bi vî rengî dibin mijara zanista destnivîsariyê/kodîkolojiyê jî.

Dema em ji vî aliyê ve li her sê Leyla û Mecnûnê arşîva A. Jaba dinêrin, em dibînin ku ev her sê nusxe ji bo şopandina pêwendiya sê berhemên cuda wek nimûneyeke girîng derdikevin pêş. Berî her tiştî di nusxeya Kurd 31ê de ku Leyla û Mecnûna Bazîdî ye û pexşan e, navê berhemê yê li ser bergê (*Kitabu Tercemeê Leyla Mecnûna Tirkî bi Zimanê Ekrad û Kurmancî*) balê dikişîne. Lewra di navê wê de hatiye îfadekirin ku ev nusxe tercumeyek e. Bêguman eger li cihekî tercumeyek hebe, pêwîst e eslê wê tercumeyê jî hebe. Dema em li ser eslê wê hizir dikin, em dibînin ku di navê wê de bersiva vê xalê jî hatiye dayîn. Lewra aşkera hatiye gotin ku ev tercemeya Leyla û Mecnûna tirkî ye bo kurdiya kurmancî. Herçiqas aşkera nehatiye gotin jî, ji peywendê bi hêsanî em dikarin fêr bikin ku mebesta Bazîdî ji Leyla û Mecnûna tirkî nusxeya Kurd 14ê ye ku di Koleksiyona Jaba de cih digire û ji aliyê Fuzûlî ve hatiye nivîsîn. Ji ber ku em dizanin Bazîdî xebatkarekî aktîf e di sazkirina koleksiyona Jaba de û li ser berhemên koleksiyonê xebatên zanistî kirine, wî bi heman rengî di çarçoveya van xebatên xwe de Leyla û Mecnûneke menzûm a koleksiyonê jî adapteyî pexşanê kiriye ku ew vî karî wek tercume bi nav dike. Dema em di çarçoveya vê peywendê de zanyariyên ku ji navê berhemê tîr wergirtin şîrove dikin encameke weha balkêş tê bidestxistin: Herçiqas di koleksiyona Jaba de Leyla û Mecnûneke kurdî hebe (Kurd 30) jî,

Bazîdî ne ev Leyla û Mecnûna kurdî, ya tirkî ku ji aliyê Fuzûlî ve hatiye nivîsîn (Kurd 14) adapteyî pexşanê kiriye.

Bêguman encameke bi vî rengî enteresan, bivênevê dê hin pirs û gumanan bi xwe re bîne: Gelo li cihê ku Leyla û Mecnûna kurdî û ya tirkî hebin, çima Bazîdî piştî xwe bide ya kurdî û berê xwe bide ya tirkî? Herweha di çarçoveya terzê xebata Bazîdî de, pêwîst bû wî ev Leyla û Mecnûn, ji Leyla û Mecnûna kurdî ya menzûm adapteyî pexşanê kiriba. Lewra em dizanin ku wî piraniya mesnewiyên evîndariyê yê edebiyata kurdî ku ji aliyê muellifên berî wî ve bi awayê nezmê hatine nivîsîn derbasî pexşanê kirine. Madem wisa ye, gelo çima Bazîdî mesnewiyên di adapteyî pexşanê kirine, lêbelê Leyla û Mecnûna kurdî adapte nekiriye? Ji aliyekî di ve ji ber ku di navê berhemê de tenê îfadeya “Leyla û Mecnûna Tirkî” derbas dibe û di vê îfadeyê de ev Leyla û Mecnûn wek ya Fuzûlî ku di koleksiyonê de cih digire nehate ravekirin, em dikarin ferz bikin ku Bazîdî ji bo adaptasyona xwe Leyla û Mecnûneke tirkî ya derveyî koleksiyonê wek jêder bi kar anîye. Bi qeneeta me ev jî ihtîmaleke gelekî lawaz e. Lewra dema em li tarîxa tîkiliyên edebiyata kurdî û edebiyatên cîran dinêrin, bi hêsanî tê çavdêrîkirin ku edebiyata kurdî ya klasîk, ji edebiyata tirkî zêdetir bi ya farisî re di nav pêwendiyê de ye û di bin bandora vê edebiyatê de dirûv wergirtiye (Adak, 2015). Loma eger tercumeya Leyla û Mecnûnekê bê kirin, ew dê ya farisî be, ne ya tirkî. Madem wisa ye, gelo ev tercume çima ne ji Leyla û Mecnûna farisî, lê ji ya tirkî be? Digel van guman û pirsîyariyan eger Bazîdî bi rastî jî berhema xwe ji Leyla û Mecnûna tirkî tercume kiribe, gelo sebebê wê çi ye?

Dema em li xebatên kurdolojiya rûsan dinêrin, em dibînin ku ev pirsyarî berê jî hatine rojevê û kurdologên rûs ên bi mijarê re pêwendîdar li ser van mijaran rawestiyane. Ji van kurdologan A. Jaba di wê baweriyê de ye ku nusxeya Kurd 31 (Leyla û Mecnûna Bazîdî), tercumeya *Leyla û Mecnûna* Fuzûlî (m. 1560) ye. Jaba di hizra xwe de derbirîna muellif bixwe esas girtiye û berhem wek tercumeya Leyla û Mecnûna tirkî qebûl kiriye. Lêbelê divê bê gotin ku Jaba tiştê li derbirîna muellif zêde kiriye û ev Leyla û Mecnûna tirkî wek Leyla û Mecnûna Fuzûlî bi nav jî kiriye. (Jaba, A, ?, Kurd 54, wr. 35a-40a; Kurd 31, wr. 1a). Piştî Jaba vê carê jî Rûdenko li pey şopa mijarê çûye û ev Leyla û Mecnûn bi Leyla û Mecnûna Bedlîsî re berawird kiriye û gihaye wê encamê ku di pêşkêşkirina Leyla û Mecnûna Bedlîsî û ya Bazîdî de wekheviyeke tam heye, li hin cihan îfadeyên wan û navên beşan bi tevahî wek hev in û peyvên erebî û farisî yê Sewadî di ya Bazîdî de hatine kurmancîzekirin (Rudenko, 1961, r. 63; Huşyar, 2013).

Bi vî awayî derheqê mijarê de du nêrînen cuda derketine holê. Li gor ya yekem berhem tercumeya Leyla û Mecnûna tirkî (Fuzûlî) ye û li gor ya duyem jî berhem tercumeya Leyla û Mecnûna kurdî (Sewadî) ye. Aşkera ye ku li vir rewşeke gelekî enteresan derdikeve holê. Lewra Jaba, hevterîbê zanyariyên ku muellifê berhemê di navê berhemê de dane, lêbelê Rûdenko hem li dijî van zanyariyên muellif, hem jî li dijî yê Jaba hizrên xwe îfade kirine. Bêguman ji ber ku Rûdenko piştî sed salî derbirînen muellifê berhemê û Jaba şaş li qelem dide, nêrîna wê gelekî balê dikişîne ser xwe. Wek çavdêriyekê em dikarin bibêjin ku Jaba serê xwe zêde bi

mijarê re neêşandiye, tiştên şênber (navê berhemê û hebûna Leyla û Mecnûna Fuzûlî di koleksiyonê de) li ber çavan girtine û bi vî awayî qeneeta xwe îfade kiriye. Heçî Rûdenko ye, wê serê xwe bi mijarê êşandiye û di çarçoveya pirsyariyên jorîn de qinyata xwe bi derbirîna muellif (Bazîdî) û nêrîna Jaba neaniye û berê xwe daye rêbaza vekolînê. Rûdenko piştî vê vekolînê gihîştîye wê encamê ku derbirîna mutercim û nêrîna Jaba şaş in û berhem ne ji Leyla û Mecnûna tirkî, ji ya Kurdî (Sewadî) hatiye adaptekirin ku ew jî nusxeya Kurd 30ê ye.

Ji bo ku em bikarin di navbera van her du nêrînan cuda de tercîhekê bikin û ji wan a rast derxin meydanê, divê em jî dest bavêjin mijarê, di vê biwarê de analîzekê bikin û bigihin encamekê. Eger em nêrîna Jaba li ber çavan bigirin, divê em nusxeya Kurd 31ê bi Leyla û Mecnûna Fuzûlî ya ku di koleksiyonê de cih digire re û eger pêwistî hebe bi Leyla û Mecnûnên dî yên tirkî re berawird bikin. Lêbelê ji ber ku nîşaneyên heyî pêwendîya wê bi ya kurdî re nîşan didin (wek Bazîdiyê ku li ser mesnewiyên dî yên evîndariyê ewqas xebat kirine, çima gelo li ser Leyla û Mecnûna kurdî xebat nekiribe?), şûna ku em Leyla û Mecnûna Bazîdî bi Leyla û Mecnûna Fuzûlî û eger pêwistî hebe bi yên dî re berawird bikin, em dê di çarçoveya nêrîna Rûdenko de wê bi Leyla û Mecnûna Sewadî re berawird bikin. Lewra rêbaza yekem rêbazeke dûrûdirêj e û nehatiye piştrastkirin, lêbelê ya duyem kurt e û ji aliyê Rudenko ve hatiye piştrastkirin. Bi qeneeta me ji bo gihîştina encamê rêya herî baş ev e. Lewra di encama vê berawirdkirinê de em dê fêhm bikin ka Rûdenko di nêrîna xwe de îsabet kiriye, yan na.

Ji bo ku Leyla û Mecnûna Bazîdî tercûmeya pexşanî ya Leyla û Mecnûna Sewadî be, pêwist e berî her tiştî rêzbendîya mijarên wan bi tevahî wek hev be. Loma em dê pêşî her du Leyla û Mecnûnan ji aliyê rêzbendîya sernavan ve berawird bikin ku di tabloya jêrîn de ev yek dikare bê şopandin:

J.	Kurd 30 (Leyla û Mecnûna Sewadî)	Kurd 31 (Leyla û Mecnûna Bazîdî)	J.
1.	Ev beş bi Besmeleyê dest pê dike. Tê de sernav tune.	Ev beş bi Besmeleyê dest pê dike. Tê de sernav tune.	1
2.	Di medha Pêşrûyê Cumle Mexlûqat Hezretê Seyyidî's-Sadat		
3.	Sebebê Te'lîfa Kitabê û Axazê Serlewheê Xîtabê	Sebebê Te'lîfa Kitêba Leyla û Mecnûnê	2
4.	Di ne'ta Mîrê 'Ereban e ba Kemalbûn Qeysê Bêmîsal A'şiq bûne li Xudanê Cemal	Di ne'ta Mîrê 'Ereban e ba kemalbûnê Qeysê Bêmîsal A'şiq bûne li Xudanê Cemal	3
5	Birina Qeys e bi Mektebê Ulfetdana Wî ye Bi Leylayê Hemseriya Wan e bi Hev	Çûna Qeys e bi Mekteb Ulfet û Mubtelabûna Wî ye bi Leylayê	4
6	Hîlesaziya Qeys û Leylayê ye Veşartina Cuzûyan û Nezerdanê.	Hîlesaziya Qeys û Leylayê ye û Veşartina Cuzûyan û Lêgeryanê	5

7	Zahîrbûna ‘Işqa Wan Bihîstina Dayeê Lewmekirina Wê ye ji Leylayê	Zahîrbûna ‘Işqa Wan û Bihîstina Dayeê û Lewmekirina Wê ji Leylayê	6
8	Inkariya Leylê ye ji ‘Işqê Baweriya Dayeê Men’kirina Wê ye Mektebê	Inkariya Leylayê ye û Men’kirina Dayeyê ye ji Çûna Mektebê	7
9	Tenhamayîna Qeysê ye Di Mektebê Gotina Wî ye li Halê Xwe ji Derdê	Eve Tenhamayîna Qeysê ye Di Mektebê danê û Gotina Wî ye bi Halê Xwo ji Derdan	8
10	Bihanekirina Mecnûn e bi Korî Dîtina Wî ye ji Boy Dilberê	Bihanekirina Mecnûn e bi Korîyê û Dîtina Wî ya Leylayê ye	9
11	Xilaskirina Wî ye Xezalê wekû ji Qeydê Rihakirina Wê ye	Xilaskirina Mecnûnî ye Xezala Girtî ji Qeyd û Benda Seyyadî û Rihakirina Wê ye	10
12	Çûna Babê Mecnûn e Di Pê Wî ve Nehatina Wî ye Ric’eta Babê	Qisseyaya Çûna Babê Mecnûnî ye Di Pê Wî danê û Nehatina Wî û Ric’eta Babê ye	11
13	Birina Mecnûn e bi Ke’bê Du’axwestina Wî ye li ‘Işqê Newmîdiya Babê	Birina Mecnûnî bi Ke’beyê û Du’akirina Wî û Bêumîdbûniya Babê ye	12
14	Xwestkariya Leylê ye Ji bo Mecnûn Nedayîna Babê ye ‘Ewdeta Wan e	Xwestkariya Leylayê ye ji bo Mecnûnî û Nedana Wî Babî Leylayê	13
15	Azadkirina Mecnûn e Girtîyê di Qeydê da Dîtina Wî ye Mehbûbê Hatina Wî	Azadkirina Mecnûnî ye Girtîyê di Qeydê danê û Ketina Wî ye Zincîrê û Dîtina Leylayê ye	14
16	Xostina Îbnî Selam e Leylayê Dayîna Babê Wê Destbûsyan e	Xwastina Leylayê ji bo Îbnî Selamî û Dana babê û Destgirtin	15
17	Çûna Newfel e bi Seydgahê Dîtina Wî Mecnûnê Hezîn Xwestkariyê Leylî	Çûna Newfel Seydê û Dîtina Wî ya Mecnûnî û Leyla ji bo Mecnûnî Xwastina Wê û Nedana Babê Leylayê ye	16
18	Leşkerkirina Newfel û Ceng Kirina Digel Babê Leylê Wî	Leşkerkirina Emîr Newfel û Cengkirina Wî ye Digel Babê Leylayê	17
19	De’wetkirina Îbnî Selam ji bo Leylayê Nehiştina Wê Weslê	Daweta Îbnî Selamî û Birina û Destnedana Wê ye	18
20	Ketina Mecnûn e li ‘Iyarê Pezî Dîtina Wî Leylayê ye Nihanî	Ketina Mecnûn e li ‘Iyarê Pezî û Dîtina Wî ya Leylayê ye bi Nihanî	19
21	Mirina Bavê Mecnûn e Hatina Wî ye Ser Mezarê Şadman	Mirina Bavê Mecnûnî û Hatina Wî ye Ser Mezarê bi Şahî û Keyf	20
22	Çûna Walida Mecnûn e Nik Wî we Bêemrîkirina Wî ye	Çûna da Mecnûn bi Nik Wî û Bêemrîkirina Mecnûnî li Dayê ye	21
23	Qesda Îbnî Selam bi Qetla Mecnûnî Mecnû’bûna Koviyan li Ser Wî	Qesda Îbnî Selamî bi Qetla Mecnûnî û Def’kirina Koviyan	22

		ji Ser wî	
24	Mulaqîbûna Mecnûn Leylê ye Paşê Mirina Leylayê Zînet	Mulaqîbûna Mecnûnî Digel Leylayê û Xeberdana Wan in	2 3
25	Wefatkirina Mecnûn e bi Derd û Xemê Hicranê 'Işqê		

**Tablo 3:** Li gor rêzbendiya sernavên beşan berawirdkirina nusxeyên Kurd 30 û Kurd 31ê.

Dema mirov bi giştî li tabloyê dinêre, ji aliyê jimara beşan ve di navbera her du nusxeyan de neahengiyek dixuye. Lewra di Kurd 30ê de 25, di Kurd 31 de jî 23 beş hene, yanî di kurd 30ê de du beş zêde ne ku ew jî beşên duyem û bîst û pêncem in. Lêbelê dema mirov lê hûr dibe derdikeve meydanê ku ev cudahî cudahiyeke şeklî ye û di binemaya xwe de ji aliyê beşan ve di navbera her du berheman de ferq tune. Bazîdî di tercumeya xwe de beşên yekem û duyem ên Kurd 30ê ku ji tewhîda Xweda û ne'ta Pêxember pêk tîne beşek û ew beş jî pir kurt biriye. Ji ber ku armanca Bazîdî tercumekirina bûyera Leyla û Mecnûnê bixwe ye, serî li vê rêbazê daye. Lewra kurtkirina van beşên dînî yên ku bi awayekî standart di serê hemû berheman de cih digirin tu kêmasiyê naîne ser mijara berhemê. Bazîdî bi heman şiklî beşa bîst û pêncem ku beşa herî dawî ya Kurd 30ê ye wek beşeke serbixwe tercume nekiriye, ew jî bi kurtî xistiye dawiya beşa bîst û çarem. Loma herçiqas di Kurd 31ê de du beş kêr jî bixuyin, di binemaya xwe de ew van her du beşan jî vedigire. Heçî beşên dî ne di navbera hemûyan de ahengeke tam heye. Wek encam tê dîtin rêzbendiya beşan û sernavên ku hatine bikaranîn di her du Leyla û Mecnûnan de wek hev in. Ev nîşaneyê girîng e ku nusxeya Kurd 31ê wergera Kurd 30ê ye.

Herçiqas berawirdiya ku li ser beşên her sê nusxeyan me kirî, pêwendiya nusxeya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) bi nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî) re piştrast dike jî, têra encameke tam nake. Lewra sernavên beşan wek hev jî bin, ihtîmala cudahiya naverok û rêza xelekên bûyeran her heye. Ji bo ku berhemek bibe tercumeya berhemêke dî, bi qasî hevbeşiya jimara beşan û sernavên wan, hevbeşiya di naverok û rêza bûyeran de jî şert e. Ji bo vê jî em dê wek nimûne du beşan bineqîn û metnên wan ji aliyê naverok û rêza bûyeran ve berawird bikin. Ji van beşan a yekem dê beşa sebebê te'lîfê be. Lewra eger sedemê nivîsîna berhemê yek be, ev dê me bigihîne encamê. Li jêrê rêza bûyeran a beşên sebebê te'lîfê yên her du nusxeyan dikare bê şopandin:

Xelekên Bûyeran	Leyla û Mecnûna Sewadî	Leyla û Mecnûna Bazîdî
1. Tewsîfa Biharê	Rojek ku biharê 'alemara Etles kiribû li bax û sehra  Mabeynê hewa bi bûyê 'enber Ba misk û 'ebîr û bû beraber	Di eyyamê weqtê biharêdanê ku dinya serbiser gulgûn û lalezar bûbî û ev alema murde gûya ji nû ve ji feyza badê sebayê û ji nefxeya nûra biharê zinde bûyî; wicûda insanî ku



	<p>. . Dil hey dikirin sedayê bilbil Şeydayê cemalê alê sorgul Xurşîdî li Xurfeya Hemel bû Meh jî li teraziya Xelet bû</p>	<p>ew jî murekkeb e ji ‘enasirêd erbe’ e û wicûd jî zêde xweyî fereh û surûr bûyî û etraf û cewanib jî bi kulîlk û şikûfêd rengîn xemilî bûn.</p>
<p>2. Pêşniyaza Nivîsîna Berhemê</p>	<p>El-qisse di vê biharê gulbîz Ez bûm li nik yekî dilawîz  Sakin li serayekî muneqqeş Dilgîr û muretteb û mufferreş  Rûniştîm û ez li pencerayê Fekrîme seharî û hewayê  Dagirtîme ber xwe ez mitalan Pamal(i) kirim xem û xeyalan  Nagah(i) mi dî derî kuşa bû Şemsek ji di nîve muncela bû  Ji ewwel ve salam û merheba kir Pirsa me kir û dilê me şa kir  Rûniştî û bi leb kirim muşerref Exbar û qeses kirin muserref  Israfi(kir)in ji her kelimê Behsa me gehîşte vê meqamê  Go şî’r û wezin çî xweş kelam in Meqbûlê cemî’ê xas û ‘am in  Hasil li me kir kemalê teklîf Îlhah û tesellutek be te’sîf  Bo xatirê ‘atirê mubarek Esla me nebû xilasî carek  Pirsî me ji wî miradê meknûn</p>	<p>Di wê eyyamêdanê ez jî di nêv serayekî alî di nêv koşk û menzilekî dilkuşa û muneqqeş danê, li nik dostekî dilawîz bûm û li ber şibakê bi kenarê deşt û sehayê danê difikirîm û min nezer dikirî. Di wê navêdanê zatekî xûbrû ji ehbaban ji der ve derî vekirî hate hundurûyê û silav dayî, rûnişt, paşê kêf û ehwalpirsiyanê me dest bi kelam û tekellum û xebere danê kirî, her derekî xeber û behs bûyî, mebhesa şu’era û xezeliyyat û kelimêd mewzûn bûnê ku kelimêd şairêd ehlê irfan qewî zêde spehî û meqbûl in. Îcarê ewî zatê ehibbayî qewî zêde ibram û ilhah li vî ‘ebdê ‘acizî kirî ku elbete tu jî tiştêkî bi zimanê kurdî lazim e ku bibêjî. Min ji wî zatî pirsiyar kir ku merama we çî ye. Ewî got qewî me îştîyaq bi Leyla û Mecnûnê heyin, lakin bi zimanê farisî ye û em lisanê farisî tînegihin û fehma metlebê nakin. Eger bi himmeta we ew Leyla û Mecnûn ji lisanê farisî bi zimanê kurmancî bête tercume û tebdîl kirin qewî qenc dibitin û kaffeê ekra dan jî fehma mealê ji wê dîkin.</p>

	<p>Go tercumekî ji Leyl û Mecnûn</p> <p>Ger wê tu wezinkî da bizanin Lewma çu bi farisî nizanin</p>	
<p>3. Dîroka Nivîsîna Berhemê</p>	<p>Halê me ji ser ve îbtîda kir Neqdek çû nebû me şehrewa kir</p> <p>Neh roj(i) tamam(i) paşê Newrûz Em bûn bedelê edîm(i) endûz</p> <p>Mexzê dev û lêv û se'yê sîne Tarîx ji wî lew ji mexzê sîne</p>	<p>Binaen eleyh ev feqîre jî ji serî îbtîda pê kir. Eger çî me filwaqî' kemal tunebûn, lakin bi mislê şehrewayê me jî dest pê kirî. Neh roj di pey Newrozê bed' pê bûyî. Çûnku eve letayif û me'arifane ji newadiratêd dev û lêv û se'ya sedrê ne. Lewranê tarîxa vê kitêbê bûye ev lefza "mexzê sîne", yanî eve bi mislê mejiya sedrê ye. Lewranê herçî letayif û mearif heyin hemû ji sedrê sadir dibin.</p>
<p>4. Hêvî û Dua</p>	<p>Lê hêvî heye ji dilbinûran Weqtê ku dibîni ew qusûran</p> <p>Islah(i) biken bi kilkê xame Da 'eybê neket cuhûlê û xame</p> <p>Ya Rebb evî nîgarê faxir Newbareê baxê dewrê axir</p> <p>Mehfûz(i) bikî ji bêfesalan Sethî yû seqîm û bêmitalan</p> <p>Pê kir me hilanî xameya xwe Teslîmê te kir me nameya xwe</p>	<p>Me hêvî ye ji eshabê kemal û idrakan ku eger eyb û qusûrekî di vê tercemeyê danê bibînin, islah bikin û efû bikin. Ya reb tu vê nûbara axirî ji bêkemalan û ji teb' giranan hifz bikî.</p>

**Tablo 4:** Berawirdkirina beşên sebebê telîfê yên nusxeyên Kurd 30 û Kurd 31ê.

Çawa tê dîtîn di beşên sebebê te'lîfê yên her du nusxeyan de hem rêzbendîya xelekên bûyeran (tewsîfa Biharê, Pêşniyaza Nivîsîna Berhemê, Dîroka Nivîsîna Berhemê û Hêvî û Dua) wek hev in, hem jî naveroka wan bi tevahî wek hev e.

Niha jî em dê ji nîveka berhemê beşa "Xilaskirina Wî ya Xezalê ji Qeydê" berawird bikin:

<b>Xelekên Bûyeran</b>	<b>Leyla û Mecnûna Sewadî</b>	<b>Leyla û Mecnûna Bazîdî</b>
<p>1. Çûna Çiya</p>	<p>Ew dîn û cunûnê pîreheçak Rabû çûye kûhê Necdê çalak</p> <p>Kûhê ku bilind û bêkeran bû Hemser bi ‘urûcê asiman bû</p> <p>Tê da ji cenawer û wuhûşan Teşbîh(i) bi ‘ewrekî xurûşan</p> <p>Mecnûn û hezîn û zar û giriyan ‘Uryan û şeqî yû sîneburyan</p> <p>Her dem ku dikir ji derdê awaz Dengê cebelî dibû hemawaz</p>	<p>Weku Mecnûn bi vî terzî êdî dînî û cunûniya wî me’lûm û aşîkar bûyî, rabûye û çûye çiyaê Necdê ... ku çiyayekî bilind û çûbûye ber bi asîmanan û li wî çiyayî ji her cins wihûş û tuyûran hebûn û Mecnûn jî hezîn û jar û giriyan û sîneburyan li wî çiyayî her dem ku dikire gaz û feryad, deng dikete kûhê wêran.</p>
<p>2. Xilaskirina Xezalê ji Davikê</p>	<p>Derhal(i) bezî û çû çiyayî Tayek ji libas(i) lê nemayî</p> <p>Nêrî ku çiya ye, belkî qafek Seyyadekî tê vedaye dafek</p> <p>Fikrî ku xezalekî siyehçav Bû ‘aşîq û muhtela û bêgav</p> <p>Teşbîh dikir bi çavê Leylê Fîlhal(i) kete hewa û meylê</p> <p>Seyyad(i) vexwend û jê rica kir Pabûs(i) kir û ji bo dewa kir</p> <p>Ye’nî bide min tu vê reha ke Minnet li me ‘aşîqê geda ke</p> <p>Elqisse reha kir ew xezale Pê ra bûye hogir û hevale</p> <p>Vê ra kete rê û çûn bi hev ra Sirrê xwe ewan dîgo ji hev ra</p>	<p>Weqtê ku Mecnûn serkol û pêxos çûyî wî çiyayî, nezer kir ku seyyadekî davik vekiriye û xezalekî çavreş jar û sêvîl ketiye wê davê û Mecnûn li wê xezalê fikirî, çavêd wê teşbîh kiriye bi çavêd Leylayê û ji boy wê xezalê ketiye derd û belayê. Îcarê Mecnûn hate nik seyyadî û dest û piyêd seyyadî ramûsayî, ji boy wî di’ a kirîn ku were rica min qebûl bike û li min minnet bike evê xezala ji davê biderîne û riha bike û ber bide. Hasilî bi minnet û lawehiyan ew xezale daye berdan û digel xwe birî. Ew xezal jî êdî ji Mecnûnî cuda nebûyî, çûye û derdê xo गया ji boy xezalê şerh û beyan</p>

	Terka wî nekir ewê xezalê Vêkra kete heyret û melalê	dikir.
3. Xilaskirina Kewê ji Qeydê	Miqdarekê rê ku çûne bala Fekrî eteka çiyayê wala  Wî dî ku kewek letîf û mehbûs Qeyd bûye zelîl û zar û me'yûs  Ew jî bi wî terzî wî reha kir Îna bi xwe ra wî aşîna kir  Wê jî kire aşîyan serê wî Geh geh difirî mil û berê wî	Wekû miqdarekê ji wê derê bi dûr ve çûyîn, îcarê Mecnûn fikirî ku li damena çiyayî dîsanê kewekî gozel spehî ketiye qeyd û bendê û meyûs û jar mayî. Mecnûn dil bi wî kewî sotî, xulase ew kew jî ji bendê xilas kirî înayî û bi xworanê aşîna kirî. Ew kew jî ji Mecnûnî cuda nedibû û gehgah li serê Mecnûnî hêlûn digirt.
4. Hevaltiya wî ya bi Derendeyan re	Hasil ku derende û perende Pê ra bi hevalî û çerende  Wehşî hemî vêk ketin li ba wî Xaliq bexişî rewatiba wî	Hasilî wihûş û tuyûr digel Mecnûnî bûyine mûnis û oldaş û ji wî nedirevîn û bi vî terzî rûs û serkol û pêxwas di nêva wihûşandanê li kûh û beyabandanê digeriya û derdê dilê xo guyanê ji boy kulê digirî roj dibuhart.

**Tablo 5:** Berawirdkirina beşên Xilaskirina Wî ya Xezalê ji Qeydê yên nuxseyên Kurd 30 û Kurd 31ê.

Çawa tê dîtin di beşên Xilaskirina Wî ya Xezalê ji Qeydê yên her du nuxseyan de jî hem rêzbendîya xelekên bûyeran (Çûna Çiya, Xilaskirina Xezalê ji Davikê, Xilaskirina Kewê ji Qeydê û Hevaltiya wî ya bi Derendeyan re) wek hev in, hem jî naveroka wan bi tevahî wek hev e. Herweha em dikarin bibêjin Bazîdî beyt bi beyt wergera nuxsêya Kurd 30ê kiriye. Bi vî awayî derdikeve meydanê ku nuxsêya Kurd 31ê tercumeya nuxsêya Kurd 30ê ye.

Ji aliyê dî ve dema em berê xwe bidin beşên nuxsêya Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî), em dibînin ku di navbera jimara beşên wê û jimara beşên nuxsêya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) de ferqeke zêde heye. Lewra jimara beşên nuxsêya Kurd 14ê 58 û ya nuxsêya Kurd 31ê 25 in. Herçiqas di nav beşên Kurd 14ê de 22 xezel û murebbeek hebin jî, dema em van derdixin jimara ku di destê me de dimîne ku 35 e, dîsa ji ya nuxsêya Kurd 31ê zêdetir e. Bi kurtî em dikarin bibêjin

ku hem kêmbûna jimara beşên nusxeya Kurd 31ê ji jimara beşên nusxeya Kurd 14ê, hem jî cudahiya wan ji aliyê hebûna xezelan ve di nusxeya Kurd 14ê û nebûna wan di nusxeya Kurd 31ê de, pêkan nadêrin ku nusxeya Kurd 31ê wek tercumeya nusxeya Kurd 14ê bê qebûlkirin. Bi kurtî Leyla û Mecnûna Bazîdî ne tercumeya ya Fuzûlî ye. Lêbelê divê em vê jî bibêjin ku nêrîna Jaba tesîra xwe di roja me de jî nîşan dide. Vê dawiyê danasîneke Leyla û Mecnûna Bazîdî ji aliyê Mustafa Öztürk ve jî hat kirin. Öztürk dibêje ku “*Ji berawirdkirina berhema Fuzûlî û ya Bazîdî tê famkirin ku Bazîdî di vê wergerê de riste bi riste û beş bi beş wergereke rasterast pêk aniye û tu mijar an bûyer nefewitandiye.*” (Öztürk, 2017, r. 113). Çawa ku di lêkolîna me de aşkera tê dîtin, di navbera Bazîdî û Fuzûlî de pêwendiyêke bi vî rengî bi tu awayî tune. Aşkera ye ku Öztürk, hay ji nêrîna Rudenko çê nebûye. Ji ber vê jî îfadeyên wek “*wekheviya riste bi riste, beş bi beş û nefewitandina tu mijar û bûyerê*” bi temamî di çarçoveya tesîr û dubarekirina hizra Jaba de ne, ne encamên lêkolîneke zanistî ne.

Niha em dîsa dikarin li mijara eslê tercumeyê vegerin. Çawa li jorê jî me behs kiribû di vê mijarê de du nêrîn hebûn. Pêşî muellifê berhemê Bazîdî gotibû ku ev tercume ji Leyla û Mecnûna tirkî ye. Piştî Jaba navê Leyla û Mecnûna tirkî danîbû û gotibû ev Leyla û Mecnûna tirkî ya Fuzûlî ye. Lêbelê piştî wan bi sed salî Rûdenko li dijî wan derketibû û gotibû berhem tercumeyêke pexşanî ya Leyla û Mecnûna Kurdî (Sewadî) ye. Ji analîza ku me kirî bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku ji van nêrînan a Rûdenko rast û dirust e. Bi vî awayî derheqê pêwendiya her sê Leyla û Mecnûnên di koleksiyona A. Jaba de em digihin encamekê.

Bêguman ev encam me bi encameke sosret re rûbirû dihêle. Lewra li gor vê encamê agahiya ku Bazîdî li ser bergê berhema xwe di navê berhemê de daye şaş derdikeve. Di vê rewşê de bi awayekî siruştî ev pirs tê bîra mirov: Gelo digel ku muellifê berhemê berhema xwe ji Leyla û Mecnûna Kurdî (ya Sewadî) tercume kiriye, çima eslê berhema xwe wek Leyla û Mecnûna tirkî (ya Fuzûlî) nîşan daye. Gelo dibe ku kesayetekî wek Bazîdî hay ji jêdera berhema xwe nebe? Gelo Bazîdî di dayîna vê agahiyê de şaşiyek kiriye, yan jî heqîqet kamufle kiriye. Ya rast tesbîtkirina bersivên van pirsan vê keliyê ne hêsan e. Ji bo şîroveyên objektîf divê em li hêviya bidestxistina hin daneyên nû bimînin û hinekî xwe ragirin. Lêbelê qet nebe em vê dizanin ku hem xebata Rûdenko, hem jî xebata ku me kiriye berê me dide rewşeke weha sosret û balkêş.

## **7. ENCAM**

Di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de sê nusxeyên dastana Leyla û Mecnûnê hene ku jimareyên wan Kurd 30, Kurd 31 û Kurd 14 in. Her nusxeyek ji van Leyla û Mecnûnan berhemeke serbixwe ye û ji aliyê nivîskarekî cuda ve hatiye nivîsîn. Di nusxeya Kurd 30ê de Leyla û Mecnûna Sewadî, di ya Kurd 31ê de ya Bazîdî û di ya Kurd 14ê de jî ya Fuzûlî cih digirin. Ji van Leyla û Mecnûnan yê Sewadî û Bazîdî bi kurdî û ya Fuzûlî jî bi tirkî ye. Nusxeya Leyla û Mecnûna Fuzûlî mecmû'eyek e ku tê de ji bilî Leyla û Mecnûna Fuzûlî, Mem û Zîna Xanî û

hin helbestên Nesîmî jî cih digirin. Lêbelê Leyla û Mecnûnên Sewadî û Bazîdî ne di nav mecmû'eyan de ne, bi tena serê xwe ne.

Bi giştî dikare bê gotin ku her sê nusxe jî ji aliyê krîterên destnivîsariyê yê wek temamî , fêmarî û dêrîniyê ve nusxeyên binirx in. Her sê nusxe jî tam in, fêmar in û di her sêyan de jî qeydên istinsaxê hene. Di qeyda istinsaxê ya Kurd 14ê de navê mustensix hatiye nivîsîn ku ew jî Tahir İbn Ebbas Efendî ye. Lêbelê di her duyên dî de navê mustensix nehatiye nivîsîn. Digel vê jî ji nîşaneyên heyî derdikeve holê mustensixê Kurd 31ê Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Di nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî) de tarîxa istinsaxê tune, lêbelê di yê Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî) û Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) de heye. nusxeya Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî) di sala 1218an (1803/1804) û ya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) di sala 1274an [1858-59] de hatine istinsaxkirin. Herçiqas di nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî) de tarîxa istinsaxê nehatiye nivîsîn jî ji nîşaneyan derdikeve holê ku navbera dîrokî ya istinsaxa wê, 1759 û 1857 in. Ji van daneyan derdikeve holê ku nusxeya Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî) berî ya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) hatiye istinsaxkirin. Heçî nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî) ye, ew jî dikeve pêşiya nusxeya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) û ihtîmal heye ku bikeve pêşiya nusxeya Kurd 14ê (Leyla û Mecnûna Fuzûlî) jî.

Her du Leyla û Mecnûnên kurdî yê ku di koleksiyona Jaba de cih digirin, di nav Leyla û Mecnûnên kurdî de wek nusxeyên xweser derdikevin pêş. Nusxeya Kurd 30ê (Leyla û Mecnûna Sewadî) ji aliyê dêrîniyê ve nusxeyeke gelekî girîng e. Lewra di nav destnivîsên ku me tesbît kirine ku jimara wan digihîje şeşan, nusxeya herî kevin Kurd 30 e. Nusxeya Kurd 31ê (Leyla û Mecnûna Bazîdî) jî ji aliyê cureya xwe ya edebî ve gelekî girîng e. Lewra di nav hemû Leyla û Mecnûnên kurdî de ku bi qasî tesbîta me 12 heb in, yekem û tekane Leyla û Mecnûna pexşan Kurd 31e. Ji aliyê dî ve divê bê gotin ku hebûna van her du nusxeyên destnivîs ên girîng di nav koleksiyona Jaba de nirxekî taybet bexşî koleksiyonê Jaba dike û wê wek koleksiyoneke girîng derdixin pêş.

Di koleksiyona Jaba ya destnivîsên kurdî de li kêleka du Leyla û Mecnûnên kurdî hebûna yeke tirkî wek xaleke balkêş derdikeve pêş. Ev bihevrebûn, bivênevê hebûna pewendiyekê di navbera wan de tîne rojevê. Ji ber ku her sê Leyla û Mecnûn ji aliyê nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn, pêwendiya wan ne bi şeweya istinsaxê ye, bi şeweya danûstandinê ye. Jixwe Bazîdî bixwe di zehriyeya Leyla û Mecnûna xwe de aniye ziman ku Leyla û Mecnûna wî tercumeya Leyla û Mecnûna tirkî ye û bi vî awayî amaje bi vê pêwendiyê kiriye. Ji kurdologên rûsyayê Jaba ew wek tercumeya Leyla û Mecnûna tirkî ku ji aliyê Fuzûlî ve hatiye nivîsîn û di koleksiyonê de di jimareya Kurd 14ê de cih digire qebûl kiriye, lêbelê Rûdenko ev nêrîn şaş li qelem daye û ew wek tercumeya Leyla û Mecnûna kurdî ku ji aliyê Sewadî ve hatiye nivîsîn û di koleksiyonê de di jimareya Kurd 30ê de cih digire qebûl kiriye. Di encama berawirdiyên ku di navbera metnan de ji aliyê me ve hatin kirin de derket meydanê ku ji her du nêrînan a Rûdenko dirust e. Ev

encam jî agahiya ku muellifê berhemê li ser berhema xwe nivîsîye şaş derdixe ku tiştê herî balkêş ev e.

## **JÊDER**

### **Çavkaniyên Çapkirî:**

**Adak**, A. (2014). “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê”, *Wêje û Rexne*, hj. 3, Diyarbekir.

**Adak**, A. (2015). “Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yê Klasîk de”, *Sempozîyûma Edebiyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (amd. Nûket Esen & Ramazan Çeçen), Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

**Bilgin**, O. (2013). “Yazma” *DIA*, (b. XLIII), İstanbul: DİB Yay.

**Binbîn**, E û Şewqî T (2005). *Mu’cem Mustelehat el-Mextût el-‘Erebî Qamûs Kodîkolocî*, Merakeş: el-Xizane el-Heseniyye er-Ribat.

**Doskî**, *Leyla û Mecnûn*, Spîrêz, Hewlêr 2004.

**Jahany**, Parviz, *Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin, Lêkolîn, Şîrove)*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2016.

**Kavakçı**, Y. Z. (1991). *İslam Araştırmalarında Usul*, Ankara: DİB Yay.

**el-Munecid**, S. (1987). *Qewa’id Tehqîq el-Mextûtat*, Dar el-Kitab el-Cedîd, Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.

**Öztürk**, M. (2017). Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan), Ankara: Lîs

**Pîrbal**, F. (2000). *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Hewlêr: Aras.

**Qenatê Kurdo** (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Ankara: Ozge.

**Rudenko**, M. B. (1961). *Opisanie Kurdskih Rukopisey Leningradskih Sobraniy*, Moskova: Izdatelbstyo Ydstdçnoy Literaturi.

**Siwadî** (1999). *Leyla û Mecnûn*, amadekirin: M. Reşit Irgat, Selman Dilovan, İstanbul: Nûbihar .

### **Çavkaniyên Destnivîs:**

**Bazîdî**, M. M. (1857). *Leyla û Mecnûn*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 30.

**Jaba**, A. (?). *Catalogue de Manuscrits Kurdes*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsyayê, j. Kurd 53.

**Sewadî**, (1759-1857). *Leyla û Mecnûn*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 30, (Xwedî: Hacî Fîrûz Efendî)

### **Çavkaniya Elektronîk:**

**Huşyar**, Cewdet, “Zexaîru’l-Turasi’l-Kurdî fî Xezainê Petersborg”, <http://brob.org/old/bohoth/bohoth/hooth026>. Htm, 29. 10. 2013.

Kurd 30

**هنا کتاب لیلی جنون**

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ • وَبِهِ نَسْتَعِينُ •  
 فَهَيْتُ كِتَابٌ نَافِعٌ • مَعْبُودٌ • قَبِيحٌ وَقَدِيمٌ وَهِيَ مَوْجُودٌ •  
 بِسَبِيلِهِ وَمَثَالٌ وَعَدْلٌ وَخَالِقٌ • سَائِرُهُ مُمَكِّنَاتٌ وَفَائِقٌ •  
 بِجَادِكِ دُخْرٌ وَ • عَطْبِيحِي • وَهَابٌ وَكَرِيمٌ هَرِّ حَبِيحِي •  
 مَوْجُودٌ كَرِيمٌ تَلْهِنْدٌ مَعْلُومٌ • مَوْجُودٌ نَوِيحِي كَهِي مَعْدُومٌ •  
 اَشْبَاهُهُ كَهِي كَرِيمٌ • مُمْتَنًا • وَجِدِجِيهِ زَبِيدٌ وَبِكْتَا •  
 بِبِي بِنِ وَبِسَارٌ وَبِي مَكَانًا • بِبِي طَرَفٌ وَجِهَاتٌ وَبِي نَشَابًا •  
 خَالِي عَرَضٌ جَنِيمٌ وَجَوْهَرٌ • بِبِي اَلتَّ وَبِقِسِّ جَلْدٌ حَبِيكٌ •

قِيع

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ • وَبِهِ نَسْتَعِينُ •  
 اَوْ مَا تَجِي دُزَارُو • بِي زَارُو • هَاتِنِ تَمَاشِيَا وَفَا • دَا •  
 دِي تِنِ دِي مَالِ صِدْقِ عَاشِقِي • كَحَقِيقِ كَرْنِ جِيِبِ صَادِقِ •  
 قِي كَرِ اَبْصَدُو اَخْرِي حَسِي • صَدَقَاتِي حَبِ جَنَابِي •  
 دِي تِنِ بِي بَايِ عَشِي نَظَاهِرِي • اَزَرِ كَرْنِ بِلْفِظِ وَخَا طَرِ •  
 اَلْقِصَّةِ لِهِي مَوْ • تَدِيَانِ • شَرْمَدِ بُو تِنِ حِي وَبِسْمِ •

مَجْنُونِ جَنَابِ مَر كَارِي •  
 دَاشْتِه مَحَاقِيَا مَرَارِي •

مَدْرَسَةُ لِي لِي جَنُونِ اَصْحَابِي  
 تَمِيوزِ افْتَدِرِ عَقْلَانِي •  
 وَلِنَا اَمَامِي بَا مَعْلَمِي •

صاحبه کتابی  
 قیوم و زین العابدین  
 الحجاج عصفی

Rûpela Pêşiyê (wr. 1b)

Rûpela Dawiyê (wr. 39b)





Kurd 14

و به  
بسم الله  
الحمد لله المجد  
قدشاع بصنعة بيانه  
وهو الابدية النهايه  
في شبه بشريه مثل ما  
كوه كوش سلكه نيل ادم  
كثاف غوامض دقائق  
بينان كن قصص بيان كرا  
يسوي بكن رياض بينه  
اشفتو زار مستخدم  
جز في ههري ههري ندر  
بشغلي محي كرفيه اميش  
دكيت بل هم اوقاد  
توفيق ايمانك نيا نشدا  
ميكلك من ربي نيا  
هنگام كه درين كوش نشدا

الرحمن الرحيم  
والشكر لصاحب المرحم  
الاعظم في البقادر شاه  
وهو الابدية النهايه  
في شبه بشريه مثل ما  
كوه كوش سلكه نيل ادم  
كثاف غوامض دقائق  
بينان كن قصص بيان كرا  
يسوي بكن رياض بينه  
اشفتو زار مستخدم  
جز في ههري ههري ندر  
بشغلي محي كرفيه اميش  
دكيت بل هم اوقاد  
توفيق ايمانك نيا نشدا  
ميكلك من ربي نيا  
هنگام كه درين كوش نشدا

Rûpela Destpêkê (wr. 1b)

في الجهاد برهم كراولى مستور  
عيب ههنا اختيار قلده  
ترك ايله تعرض ارادى  
ببهود بهر معرض ايله  
دم خير سوزندن اورده مادم  
هم مصلحت اوكد اورده مادم  
قارن بركن  
كه حطاي نت  
ابن خطاي  
از كنم والله  
عنت الكتاب  
لكل الوهات  
العناد  
اخذى  
في شهر ربيع الاخر  
١٥ من الحوت  
و حاله  
م. ح. ب. و ملك عبد الرحمن  
افندي في شهر ربيع الاخر  
بني محمد بن محمد بن روى  
نصفه نيا صفة

بر شوقه ذوقدن دكل دور  
شعرم حدين شعار قلده  
كم نوادى جهاد بر وادى  
كه قادر كن جوانب سياه  
ور خير دمس ايسم ايسم  
ختم ايله لم كه خير يا لقم  
خبر خطاب  
پلندا از كتاب  
رفق زانصم كن  
اعلم بالعراب  
بعرف الله  
على يد امجد  
طاهر بن عليان  
بسم الله

Rûpela Dawiyê (wr. 83b)